Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 401 nameronahi@gmail.com 27 - Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# LI KOBANÊ SÎSTEMA PARASTINÊ XURT DIBE






Komkujiya 25'ê Hezîrana 2015'an ya li dijî welatiyên Kobanê, yek ji komkujîyên herî xwînî ya van 7 salên dawî yên şerê li Sûriyê ye. Çavdêran diyar kir ku sedema sereke ya komkujiyê tunebûna parastina hundirîn bû. Lê piştî 3 salan sîstema parastinê ya Kobanê hat pêşxistin.

Piştî ku şervanên YPG'ê û YPJ'ê Kobanê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin, di berbanga 25'ê Hezîrana 2015'an komên çete bi awayekî veşartî derbasî nava Kobanê bûn. Komên çete vê rojê êrîşî Kobanê kirin zarok, jin kal û pîr bi sedan kes qetil kirin.

3 sal di ser vê komkujiyê re derbas bûn. Bêyî ku plana mezin ku Tirkiyê li dijî gelê kurd dimeşîne û eşkere alîkariya DAIŞ'ê dike di ber çavan re were girtin, gelek çavdêr diyar dikin ku sedema sereke ya ku hiştiye komkujî pêk were, lawazbûna sîstema xweparastina hundirîn li Kobanê û gundewarê wê bû.

**PIŞTÎ KOMKUJIYÊ AVAKIRINA HÊZÊN PARASTINÊ**

Piştî buyerên komkujiyê gelek civîn hatin lidarxistin û di wê demê de di destpêka meha Tîrmehê de yekîneyên leşkerî yên taybet bi parastina bajêr û hemû gundan hatin avakirin û bi navê Hêzên Parastina Civakî hatin nasîn.

Ev hêz ji ciwan û jinên ciwan ên bajêr û gundan pêk dihat û nobedariya parastina gund û bajarên xwe digirtin. Endamên Hêzên Parastina Civakî hatin perwerde kirin.

Di 19'ê Tîrmeha heman salê de yekemîn dewreya perwerdeyê bi beşdarbûna 30 endaman li akademiya Şehîd DiloVan a li bajaroka Şêran a gundewarê Kobanê pêk hat. Akademiyê heta niha hezaran kes perwerde kirin.

Piştî hilbijartinên meclîsên herêmî di 1'ê Çileya 2017'an de êdî sîstema parastinê bêtir di nava gotûbêjan de ye ku herî zêde di vê qonaxê de pêwîst e. Hêzên Parastina Civakî 4 navendên xwe li bajêr û bajarokên Kobanê vekirin. Ev navend hewl didin rêgeza xweparastinê bi rêya dewreyên endamên xwe pêk bînin.

Akademiya Şehîd Kendal jî 10 dewreyên leşkerî ji şervanên Hêzên Erka Xweparastinê re bi dawî kirin û niha li seranserî kantonê û li ser sînor hatine belavkirin da ku rê li pêşiya derbasbûna çeteyan ji aliyê Tirkiyeyê ve bigirin.

Li aliyê din Hêzên Asayîşê ewlehiya hundirîn a bajarê Kobanê û gundewarên wê bi riya bendên kontrolê yên leşkerî xurt dike. Her wiha dewreyên hêzên taybet jî Hêzên Antî Teror (HAT) jî bi dawî kirin.

Hêzên Asayîşê di seranserî rojê de dewriyeyên xwe di nava bajêr û gundewar de dimeşîne û hemû çalakiyên welatiyan ku tên lidarxistin, diparêze...***ANHA***

## Serjêkirina pez hat qedexe kirin




تعميم

Buroya Tenduristiyê a Cirniyê nameyek ji Komîteya Aboriyê re şand û xwest ku serjêkirina pez were qedexekirin.

Buroya Tenduristiyê ya Şaredariya Gel a Cirniyê nameyek ji Komîteya Aborî ya Rêveberiya Xweser a Tebqayê re şand û tê de xwest ku serjêkirina pez were qedexekirin. Name ji aliyê çavdêrên Buroya Tenduristiyê ve li bajarok û gundên Cirniyê, Mehmûdliyê û Til Esman hate belavkirin.

Tê zanîn ku sedema vê qedexeyê ew e ku hejmara lawiran zêde bibe, ji ber ku jiyana mirovên gundan li ser xwedîkirina lawiran e, lewma biryareke wiha hate dayîn.

Hejmara pez li herêma Cirniyê û hawirdora wê derdora 10 hezaran e.

Hêjayî gotinê ye ku hejmara lawiran di salên dawîn de gelekî kêm bû, ji ber ku gelek pez derket derveyî welat û ji ber dagirkirina heremê ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve nirxê êmê pez jî buha bû...***ANHA***

## Li Kobanê navendeke nû ya tenduristiyê vebû

Heyva Sor a Kurd li kantona Kobanê bi alîkariya rêxistina Bijîşkên Sînornenas, navenda xwe ya tenduristiyê li bajarokê Bênder vekir. Navend wê xizmeta tenduristî bide 62 gundan.



Heyva Sor a Kurd li kantona Kobanê ji bo xizmeta şêniyên herêmê ji aliyê tenduristiyê ve bi alîkariya Bijîşkên Sînonenas navenda xwe ya tenduristiyê li bajarokê Bênder yê girêdayî herêma Qenaya ya rojavayê kantona Kobanê vekir.

Li gorî rêveberên Heyva Sor, ev navend wê li 62 gundan dermanan belav bike.

Her wiha navenda tenduristiyê wê aşleyên rêtîn li dijî nexweşiyên BCG, sorik, MMR û kizazê bike û her wiha aşleya vîtamîn A û aşleyên laşmaniyê ji bo şêniyan pêk bîne...***ANHA***

## Kaniya dîrokî tê sererast kirin

Şaredariya Gel a navçeya Eyn Îsa dest bi xebatên sererastkirina kaniya navçeyê ya dîrokî kir.

Komîteya xizmetguzariyê ya Şaredariya Gel a navçeya Eyn Îsa dest bi paqijkirina kaniya dîrokî kir.

Endamê Komîteyê Fadil Şeibo diyar kir ku ji ber dîroka kaniyê wan dest bi xebatên sererstkirinê kirine da ku avahiya kaniyê zirar nebîne.



Tê payîn ku xebatên sererastkirina kaniyê mehekê bidome.

Navçeya Eyn Îsa navê xwe ji kaniyê û ji ziyareta Şêx Îsa ku di dema DAIŞ'ê de hatibû wêrankirin, girtiye...***ANHA***

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 401 27- Hezîran - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## 2 hezar û 194 roj in nobedê digirin



Nobeda azadiyê ya ji bo Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan dikeve hefteya 313'an. Nobeda azadiyê ya ku ji 25'ê Hezîrana 2012'an li bajarê Strasbourg yê Fransayê ji bo Ocalan dest pê kir, 2 hezar 194 roje bi rengekî bê navber berdewam dike. Heta niha hêjmara nobedaran gihiştiye 1500 kesî.***R-5***

# TEVÎ ZEXT Û ÊRÎŞAN JÎ HDP'Ê BEND HILWEŞAND

Li bakurê Kurdistanê û Tirkiyê di 24'ê hezîranê de hilbijartinên pêşwext yên serokkomariyê û parlemenê hatin lidarxistin. Bi mîlyonan hilbêjir di bin rewşa awarte û bi taybet li Kurdistanê di sîya çekan de çûn ser sandoqan. Tevî hemû êrîşan jî HDP'ê benda hilbijartinê derbas kir û bi 67 parlementer ket meclîsê.

### TEKOŞÎNA ME WÊ DEWAM BIKE

Namzetê serokkomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş têkildarî encamên hilbijartinê li ser hesabê xwe yê medyaya civakî daxuyaniyek da. Demîrtaş got, "Di van şertan de serkeftineke mezin e ku HDP ew ê di meclîsê de cih bigire. Di nava meclîsê de û li derveyî wê, li hemû qadên sivîl em ê têkoşîna herî bibîryar a ji bo berjewendiya gelan bidomînin." ***R-2***

### BÊ HDP DEMOKRASÎ NABE

Hevserokên Giştî yên HDP'ê Pervîn Bûldan û Sezaî Temellî, li ser encamên hilbijartinên 24'ê Hezîranê daxuyaniyeke hevpar dan. Di daxuyaniyê de hate gotin, "Li ser binpêkirina mafê dengdanê û zext û zordariyê, em ê raporekê eşkere bikin. Derheqê encaman de hê jî gumanên me hene. Derket holê ku li Tirkiyê bê HDP demokrasî nabe. "***R-2***




### LI SER KURDAN ZEXT HEBÛ

Heyeta çavdêr a ku ji bo şopandina hilbijartinê ji Danîmarkayê hatibû Çewlikê diyar kirin ku, hemû pêvajo ji bo partiya desthilatdar hate kirin. Endamên heyetê wiha gotin, "Me dizanibû li Tirkiyê rewş ne baş be, lê ne li benda rewşeke wisa xerab bûn. Em bûn şahid ku li ser kesên mûxalif zext tê kirin. Leşkeran gef li me xwarin, cerdevanan jî êrîşî me kirin." ***R-2***

### SERKETINA HDP'Ê CIHÊ KÊFXWEŞIYÊ YE

Hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên ku li Tirkiye û bakurê Kurdistanê hatin lidarxistin di çapemeniya cîhanê de jî cihekî fireh girt. Di çapemeniya cîhanê de hate ragihandin ku Erdogan û tifaqa nîjadperest AKP-MHP bi hîleyan di hilbijartinê de 'bi ser ketine' û hat gotin ku yekane diyariya ku dilê mirovan xweş dike' derbasbûna HDP'ê ji benda hilbijartinê ye. ***R-5***

## Bab û Minbic li dijî dagirkeriyê meşiyan



Bi hezaran welatiyên Bab û Minbicê li dijî êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk meşeke girseyî lidarxistin. Di meşê de dûrûşmeyên weke, "Na ji dagirkeriya Tirk re" hatin avêtin. Di meşê de axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku wê hemû pêkhate li dijî dagirkeriya Tirk ya ku dixwaze Sûriyê parçe bike, bisekinin û ewlehî û aramiya herêma xwe biparêzin." ***R-2***

## Li Efrînê herî kêm 6 çete hatin kuştin



Di çarçoveya pêngava duyemîn ya Berxwedana Serdemê de şervanên YPG'ê û YPJ'ê li Efrînê bi çalakiyên bi bandor derbên giran li dagirkeran didin. Navenda Ragihandina YPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di encama çalakiyên şervanên wan de herî kêm 6 leşker û çeteyên dagirker hatine kuştin. ***R-2***

## Gerîla lê da, 16 leşker hatin kuştin



Şerê li bakurê Kurdistanê yê di navbera gerîlayên Kurdistanê û artêşa Tirk ya dagirker de berdewam dike û gerîla bi li dijî artêşa dagirker çalakiyên bi bandor dikin û derbên giran li wan didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku di encama çalakiyên gerîlayên wan yên li Colemêrg û Çewlikê de 16 leşker hatine kuştin. ***R-2***

## Efrîn wê rizgar bibe û dagirkerî têk biçe

Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê bi wesîleya salvegera sêyemîn a komkujiya Kobanê daxuyaniyek weşand. TEV-DEM'ê di daxuyaniyê de wiha got, "Em soz didin gelê xwe ku wê Efrîn were rizgarkirin û wê gelê me bi awayekî bi rûmet vegera ser axa xwe. Berxwedana me bi hemû rêbazan didome. Wê serkeftin bibe ya me û dagirkerî têk biçe." ***R-4***

## Şehîdên 25'ê Hezîranê hatin bibîranîn




Roja 25'ê Hezîranê ya sala 2015'an çeteyên DAIŞ'ê êrîşî Kobanê kirin û bi awayekî hovane bi sedan welatiyên sivîl şehîd kirin. Bi wesîleya salvegera komkujiyê malbatên kesên ku di komkujiyê de şehîd bûne li ser gorên wan ew bibîr anîn. ***R-2***

## Em rê nadin aramiya herêma me têk here



Li ser hewldanên tevliheviyê û têkbirina ewlehî û aramiya li Reqayê Şêx û Rûsipiyên Reqayê li navenda bajêr li çerxerêya El Neîm daxuyaniyek dan. Şêx û rûsipiyan piştgiriya xwe ya bi QSD'ê re ragihandin û wiha gotin, "Em rê nadin ku hewldanên tevliheviyê li herêma me bi serkevin." ***R-4***

## Em êrîşên li dijî erdên Iraqê red dikin



Li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk li ser xaka Iraq û Başûrê Kurdistanê Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî li gel Desteya Wezîran civiya. Piştî civînê têkildarî naveroka civînê ofîsa Serokwezîrtiyê daxuyaniyek da û wiha hate gotin. "Hemû cûrên êrîşên li ser xaka Iraqê em red dikin. Ji bo pêşîgirtina li derbaskirina sînor û êrîşên li ser xaka Iraqê hinek biryar hatin girtin." ***R-4***

# Li Efrînê 6 çete hatin kuştin

***Di çarçoveya pêngava duyemîn ya Berxwedana Serdemê de şervanên YPG'ê û YPJ'ê li Efrînê bi çalakiyên bi bandor derbên giran li dagirkeran didin. Navenda Ragihandina YPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di encama çalakiyên şervanên wan de herî kêm 6 leşker û çeteyên dagirker hatine kuştin.***

Navenda Ragîhandinê ya YPG'ê diyar kir ku di hefteya sêyemîn a meha Hezîranê de li Efrînê li dijî Artêşa Tirk û çeteyên wê rêzeçalakî lidar xistin û got ku herê kêm 6 çete hatin kuştin û hejmarek çete birîndar bûne.
Navenda Ragîhandinê ya YPG'ê têkildarî çalakiyên di hefteya sêyemîn a meha Hezîranê de li kantona Efrînê pêk hat, daxuyanî da.
Daxuyaniya YPG'ê ya li ser malpera fermî hate weşandin de hat gotin ku di çarçoveya pêngava duyemîn a Berxwedana Serdemê ku li dijî artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê pêk tê, yekîneyên me di hefteya sêyemîn a meha Hezîranê de rêzeçalakî pêk anîne. YPG'ê diyar kir ku di van çalakiyên ku li gundên Şera û Bilbilê her wiha gundên Xerabê Şera, Gundê Hiyama yê Bilbilê, li navenda Efrînê de herî kêm 12 çete hatine kuştin.
YPG'ê diyar kir ku hejmara leşker û çeteyên artêşa tirk a dagirker ku ji destpêka Berxwedana Serdemê heya niha hatine kuştin gihîşt 2485 an."



## Bêyî HDP demokrasî nabe



Piştî zelalbûna encamên nefermî yên hilbijartina 24'ê Hezîranê Hevserokên Giştî yên HDP'ê Pervin Buldan û Sezai Temelli li Enqereyê li Navenda Giştî ya HDPê encamên demkî nirxandin.
Hevseroka HDP'ê Pervin Buldan di axaftina xwe ya nirxandina encamên hilbijartinê de got: Encamên hilbjartinê nîşan dane ku gelên Tirkiyê destnîşan kiriye ku rejîmeke parlamenter bêyî HDP'ê, têkoşîneke demokrasî û edaletê bêyî HDP'ê nabe. Gelan diyar kirine ku aştî, demokrasî, jiyana azad û pirrengî bêyî HDP'ê nabe." Derheqê encaman de hê jî gumanên me hene. Heta encamên fermî neyên eşkerekirin divê îtîbar bi encaman neyê dayîn."
Pervin Buldan di berdewamiya axaftina xwe de got: "Tevî hemû astengî û neqanûniyan jî namzedê HDP'ê Selaheddin Demirtaş di hilbijartinên serokomariyê de sêyemîn derket. Piştî van encaman divê Demirtaş serbest were berdan. Em ê bi lijneyên rêvebir ên partiyê re civînên xwe li dar bixin û ji bo xebata pêşerojê binirxînin."
Sezai Temelli jî di axaftina xwe de got: "Di dema kampanyeya hilbijartinê de gelek caran rêvebir û hevalên me rastî êrişan hatin, lê tevî her tiştî em ê li gor baweriya xwe ya bi demokrasiyê xebatên xwe bidomînin. Em ê îradeya hilbijêran biparêzin. Hetanî ev pêvajo bi dawî bibe em ê nobedariya xwe ya demokrasiyê bidomînin. Heta encamên dawî werin eşkerekirin em şopa xwe ya dengan bişopînin."

## Serketina mezin a HDP'ê ye



Namzetê serokkomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş têkildarî encamên hilbijartinê li ser hesabê xwe yê medyaya civakî daxuyaniyeke kurt kir.

Demîrtaş ji Girtîgeha Edîrneyê encamên hilbijartina 24'ê Hezîranê nirxand.

Demîrtaş wisa got:

"Ez partiya xwe HDP'ê pîroz dikim a ku ligel şertên Rewşa Awarte, zext û zordariyan benda hilbijartinê derbas kir. Ez îradeya gel silav dikim a ku li derdora HDP'ê bû xeleq. Di van şertan de serkeftineke mezin e ku HDP ew ê di meclîsê de cih bigire.

Di nava meclîsê de û li derveyî wê, li hemû qadên sivîl em ê têkoşîna herî bibîryar a ji bo berjewendiya gelan bidomînin.

Bi taybetî ez ciwan û jinan spas dikim ku di vê kampanyayê de roleke pêşeng lîstin. Bêyî ku em gavekê bi paş ve biavêjin, em ê li derdora rêgezên xwe têkoşîna xwe bidomînin.

Bêedalatiya herî mezin ev bû ku min di girtîgehê de kampanya bi rê ve bir. Ji ber vê jî ew ê meşrûbûna encaman jî were nîqaşkirin.

Namzetên din 100 mîtîng lidarxistin, min jî tenê 100 tweet nivîsand. Çi ji destê min hat, min ji bo gelê xwe kir. Min hewl da rol û mîsyona xwe bi cih bînim. Ez bawer dikim ku keda min jî heye ku me HDP bir meclîsê. Pozîsyona min çi dibe bila bibe, ez ê bêyî navber têkoşînê bidomînim.

## Şehîdên 25'ê Hezîranê hatin bibîranîn



Şehîdên 25'ê Hezîranê li ser gorên xwe hatin bibîranîn.
Bi munasebeta salvegera komkujiya Kobanê malbatên kesên ku di komkujiyê de jiyana xwe ji dest dan ew bi bîr anîn.
Di 25'ê Hezîrana 2015'an de çeteyên DAÎŞ'ê li Kobanê komkujî pêk anîbûn. Gelek jin û zarokan jî di komkujiyê de jiyana xwe ji dest dan. Malbatên kesên jiyana xwe ji dest dan, Endamên Rêveberiya Xweser, Kongreya Star, TEV-DEM, Hêzên Asayişê çûn ser goristanên kesên ku di komkujiyê de jiyana xwe ji dest dan. Li goristanê ji bo bîranîna şehîdan merasîmek hat lidarxistin.
Endamê Rêveberiya TEV-DEM'ê Ehmed Şêxo axivî û got: "Em wekî gelê Kurd bi gelek komkujiyan rû bi rû mane. Lê dîsa jî em dev ji têkoşîna xwe bernadin."
Piştre malbatan li ser goristanan find vêxistin.

## Gerîla lê da, 16 leşker hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir, 22'ê Hezîranê li Colemêrgê 12 leşker hatin kuştin û 19'ê Hezîranê jî 4 leşkerên îstîxbaratê li Çewlikê birîndar bûn.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de hêzên wan li Colemêrgê li hêzên dagirker ên artêşa Tirk xistine.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin: "22'ê Hezîranê hêzên me yên YJA Starê li dijî dagirkerênj li ser girê Xeregolê yê li navçeya Çelê çalakiyek kirin. Di çalakiyê de derbên giran li çeperên dijmin hatin xistin û 4 leşker hatin kuştin. Hêzên me heman rojê saet 15:50'î, careke din li dagirkeriyên li ser girê Xeregolê xistin. Di çalakiyê de 8 çeperên dijmin ên li ser gir hatin rûxandin û bi qasî ku hate tespîtkirin, 8 leşkerên dijmin hatin kuştin."
Di dewama daxuyaniyê de li ser çalakiya 19'ê Hezîranê ya li Çewlikê ev agahî hatin dayin: "19'ê Hezîranê saet 15:00 hêzên me li cihekî navbera Çemêhenî û Devalan ên navçeya Hênê ya Çewlikê li dijî wesayiteke ku tîmên jendermeyan ên îstîxbaratê tê de bûn çalakiyeke sabotajê kirin. Di çalakiyê de 4 tîmên îstîxbaratê birîndar bûn ku birîndar 2 ji wan giran e. Hêzên dagirker piştî çalakiyê dest bi operasyonê kirin. Operasyon 22'ê Hezîranê bi rengekî bê encam qediya."

## Bab û Minbic li dijî dagirkeriyê meşiyan

Hezaran şêniyên herêma Bab û Minbicê li dijî dagirkeriya dewleta tirk meşeke girseyî lidarxistin.
Bi hezaran welatiyên herêma Babê yên ku niha li Minbicê dimînin, meşeke girseyî li dijî dagirkeriya dewlata tirk li dar xistin. Çalakvanan ala Meclisa Leşkerî ya Minbicê, Meclisa Leşkerî ya Babê û pankartên dijberiya dagirkeriya dewleta tirk li ba kirin.
Di meşê de durûşmeyên weke, "Na ji dagirkeriya Tirkiyê re", "Gelên Sûriyê tev yek in", "Hilweşe Erdoganê faşîst" hatin avêtin.
Di çalakiyê de li ser navê Meclisa Jinan a Xeta El-Feqrat Emîna Cerah, li ser navê Meclisa Xeta El-Feqrat Farûq Şêx û li ser navê Rêveberiya Xweser a Minbicê Adil Ferhad axivîn.
Di axaftinan de hate diyar kirin ku wê hemû pêkhate li dijî dagirkeriya Tirk ya ku dixwaze Sûriyê parçe bike, bisekinin û ewlehî û aramiya herêma xwe biparêzin. Kesên ku axivîn bang li hemû gelê cîhanê û saziyên navnetewî kirin ku li hemberî gef û êrîşên dewleta Tirk derkevin.

## Cerdevanan êrîş kir, leşkeran gef xwarin



Heyeta çavdêr a ku ji bo şopandina hilbijartinê ji Danîmarkayê hatibû Çewlikê diyar kirin ku, hemû pêvajo ji bo partiya desthilatdar hate kirin û leşkerên li gund gef li wan xwarine.
Heyetên çavdêr ên navneteweyî yên ku ji bo şopandina bêedaletiya di hilbijartinan hatibûn Agirî, Şirnex, Êlih û Batmanê, hatin destgîrkirin. Cerdevanan êrîşî heyeta çavdêr kirin a ku ji Danîmarkayê hatibû Çewlikê.
Ji partiya Sor-Kesk a Danîmarkayê Jette Mohr a ku di dema dengdanê de li Çewlikê çû serdana 11 dibistanan, diyar kir ku wan dizanibûn li Tirkiyê rewş ne baş be, lê ne li benda rewşeke wisa xerab bûn. Jette diyar kir ku wan xwest li gundê Mûrat ê Solaxana Çewligê hilbijartinê bişopînin lê ji ber vê daxwaza wan êrîş li wan hatiye kirin. Jette got, "Em ji bo mebesteke aştiyane çûn Çewlikê. Lê alîgirên fanatîk ên partiya desthilatdar êrîşî me kirin."
Jette diyar kir ku leşkerên li pêş deriyê dibistanê ew kirine hedef û ji bo ku ew ji gund derkevin gef li wan hatiye xwarin.
Çavdêreke din a jin Stînna Dore jî got, "Me dît ku pêvajoya hilbijartinê ya li Çewlikê ji bo partiya desthilatdar hatiye kirin. Em bûn şahid ku li ser kesên mûxalif zext tê kirin."
Stînna got, "Ji ber vê rewşê, em bi fikar in. Li gelek cihên ku em çûnê, şer û nîqaş hatin kirin. Endamên partiya desthilatdar ji dêvila lihevkirinê gelek caran gazî hêzên ewlehiyê kirin."



# Li Xerbî projeyên nû yên çandê

***Li taxa Xerbî yê Qamişlo projeyên nû yên çandê tên pêşxistin. Endamê komîteya çand û hunerê Cemîl Ehmed diyar kir ku ji bo dîroka resen bi nifşên nû bidin nasîn û ciwan li çanda xwe xwedî derkevin wê xebatên nû birêve bibin.***



**Melek DEMÎRTAŞ**

Di nav diyarde û têgînan de ya herî zêde wateyên dewlemend jê re hatiye dayîn têgîna çand û hunere. Ji ber ku çand û huner nasnameya gel û mirovan pênase dike, ji bo wê pêwîste em li çanda xwxwedî derkevin. Wekî rojnameya Ronahî serdna Bajarokê bajarê Qamişlo yê milê Xerbî kir û Endamê bajarokê Xerbî beşê çand û hunerê Cemîl Ehmed diyar kir ku pêwîste em ciwan û nifşên nû çand û dîroka resen bi wan bidinn nasîn da ku nasnameya tekoşîn û welatparîziyê winda nekin."

### 10 KOMÎTE HENE

Girêdayî mijarê Endamê Bajarokê Qamişlo ya milê Xerbî beşê Çand û hunerê Cemîl Ehmed ser xebat û projeyên nahiya Xerbî başê çandê ev agahî dan: "Bajarokê milê Xerbî ji 10 komîteyan pêk tê wekî komîteya (Parastın, tendrustî, perwerde, çand, jin, aborî, ciwan, lihevanînê, ixmetguzarî û civak). Em wekî komîteya beşê çandê ji bo ew çanda ku bi sedê salan hatiye çewsandin, dîsa nûjen bikin û di nav gel û civakê de geş û belav bikin."

### BÎ KOMÎNAN DEST BÎ XEBAT KİRİN

Cemîl diyar kir ku wekî beşê çandê projeyên avakirina malên çandê hene û wiha got:"Ji bo bi serketina vê projê me ji komînan de det pêkir û li hemû komînên taxa Xerbî serdan kirin. Di encam serdanê de û bi alîkariya komînan wekî komîteyek çandê li taxa Xerbî hate avakirin ku di hundurê komînan çalakî û semînerên ser çan û exlaq bidin hate avakirin."

### XWEDÎ Lİ HUNERMENDAN DERKETİN ERKA MEYE

Her wiha li taxa Hilêliyê jî grupek ji hunermend heye, lê ji ber ku navenda çand û hunera Mihemed Şêxo dure zêde serdana nakin, ji bo ku em vê çareser bikin projeya avakirina malek çandê hate pêşniyar kirin ku niha li Himîo û taxa Qidurbeg hatiye avakirin dê wê li taxa Hilêliyê jî bê avakirin."
Cemîl da zanîn ku ji bo pêşxistin û hêzdayîna hunerê gele proje hene û wih agot: "Pirsgirêka bingehîn a civakê ne naskirina çand û hunera wê ye, ji ber ku dema civak çanda û dîroka xwe nas neke, dê valatiyê jiyan bike û kirasê çandê din li xwe bike. Ji bo wê jî erka me ku em çanda xwe di civakê pêşbixin û civakê ji van nexweşiyan hişyar bikin me dest bi projeyên nû dikin."

### PROJEYÊN NÛ HENE

Cemîl Ehmed di dawî de çen projeyên nû bi lêv kir: "Di demên pêş de dê mala helbestvan û nivîskar Seydayê Ceger xwîn û nemir hunerend Mihemed Şêxo malên wan ji bo danesîna çand û hunera wan ji ciwana û nifên nû re bi din nasîn û li keda wan xwedî derkevin û 0di civakê de zindî bikin. wekî proje dê malên wan bikin mûze, çi ji pirtûk, cil, û hemû berhemên wan bidin hev û di malên wna de kom bikin û bikin mûze."

## Helbestvanê Kurd banga boykota rêzefilmên Tirkî kir



Salih Bêçar nerazîbûna xwe ya ji bo dagirkeriya dewleta Tirk anî ziman û bang kir ku mal û rêze filmên Tirkî werin boykot kirin.
Dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistanê berdewam dike. Helbestvan û nivîskarê Kurd Salih Bêçar di derbarê dagirkeriya dewleta Tirk de axivî got; "Ev sed sale xewn û hewldana komara Tirk êrîş û dagirkeriye. Dewleta Tirk ji dîrokê ve heya niha, bi rêya aborî, leşkerî, vekirina zanîngehên Tirkî yên li Herêma Kurdistanê, weşandina rêzefilmên Tirkî dagirkeriya xwe berdewam kiriye. Malên Tirkî ziyanê didin malên Kurdî."
Helbestvan û nivîskarê Kurd Bêçar di dewama axaftina xwe de bang li Herêma Kurdistanê kir ku mal û rêzefilmên Tirkî boykot bikin.
Bêçar got; "Herkes dikare ji aliyekê ve çalakiyek bike. Welatî dikarin bi boykotkirina malên Tirkî helwesta xwe bidin nîşandan. Di mal de malbat dikarin rêzefilmên Tirkî temaşe nekin. Min û malbata xwe hemû malên dagirkeran boykot kirine."
Helbestvan Salih Bêçar di dawiyê de wiha got; "Em helbestvan û nivîskar dikarin bi nivîsên xwe dagirkeriya dewleta Tirk bêxin ber çavan. Ger em vê yekê bikin wê raya giştî jî ji dagirkeriyê agadar bibe. Min li ser berxwedana Şengal, Kobanê û Efrînê ya li dijî dagirkeriya dewleta Tirk helbest çêkirine."…
***ROJNEWS***

## Platforma Helbestvanên Tebqayê hate lidarxistin



Sêyemîn Platforma Wêjevan û Helbestvanên herêma Tebqayê bi dirûşma "Sûriye dergûşa şarestaniyan û kaniya çandan e" hate lidarxistin.
Paltform ji aliyê Komîteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê bi hevkariya Mala Gel a herêma El-Mensûra ve li bin konekî li herêma El-Mensûra hate organîzekirin.
Hevserokên Meclîsa Zagonsaz Hamid El-Ferec û Roşîn Hemî, Seroka Partiya Sûriya Pêşerojê şaxa Tebqa Musene Semîr, endamên sazî û meclîsên El-Mensûra û her wiha hejmarek rewşenbîr jî tevlî platformê bûn.
Hevserokê Meclîsa Zagonsaz Hamid El-Ferec û Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê buroya Tebqayê Musene Semîr axivîn û piştgiriya dewlemendbûna çanda Erebî kirin. Her wiha li ser navê hemî pêkhateyên Tebqayê soza destekdayîna welatiyên Efrînê dan.
Piştre helbestvanan helbestên xwe xwendin.

## Şêwekarê 'xeyaleke xerîb'



Pêşangeha wêneyên hunermendê kurd ê ji Hewramanê, Başîr Naserî li Cafe Chalak Eventsê dê heta 19´ê tîrmehê vekirî be. Naserî navê "Xeyaleke Xerîb" li hunera xwe dike.
Bashîr Naserî ji bilî wêneyan bi çêkirina peyker û grafîkan re jî mijûl dibe. Bashîr Naserî ev du sal in ku li Amedê dijî û li vir xebatên xwe yên hunerî dewam dike. Di nûçeya Bianetê de ku Murat Bayram amade kiriye em fêr dibin ku Naserî li Zanîngeha Tehranê, li Fakulteya Wênesaziyê perwerde bûye û sala 2004´an zanîngeh qedandiye.
Bernameyeke hunerî
Nêzîkî 20 salan e ku hem li Îranê û hem jî li rojhilatê Kurdistanê di gelek muze û galeriyan de pêşangehên wî çêbûne. Heta niha peykerê muzîkjenê kurd Ghala Mara, yê helbestkarê kurd Abdurrahîm Mewlewî, yê helbestkarekî din ê kurd Mîrza Abdulkadîr û yê Pîremêrd çêkiriye.
Dema ku behsa xwe dike Nasaerî dibêje, ew ji Hewramanê ye û wiha dewam dike: "Demeke zêde ye li ser karê neqqaşiyê dişuxulim. Bavê min resam e. Ev nêzî 2 salan e li Amedê dijîm. Li Amedê li Zarok TV'ê dişuxilim."
'Berhemên min bi giştî ez im'
Ji bo navê hunerê xwe jî Naserî wiha got: "Ez nizanim belkî bibêjim, 'xeyalî xerîbî min', ango xeyaleke xerîb ketiye dinyayî îro. Xeyaleke xerîb ku li jiyaneke mentiqî û li jiyaneke realîst a îro de dijîm. Berhemên min bi giştî ez im. Dema ku ji diya xwe bûm heta niha ku welatekî din dijîm, ew jî welatê min e, parçeyekî din ê min e, ew jiyana min e. Nikarim bibêjim çawa dest pê kiriye, çi bûye ku kiriye ew bibe berhem."…***Jêder/e-rojname***




## Girîngiya Folklorê

**Derwêş M. FERHO**

Folklor, zanista gel e (folk, people - lore, traditions = gel - aded). Her tiştên ku bi gel ve têkildar e wek; çand, wêjeya gel, aded, bawerî, şîn û şahî, muzîk, xwarin-vexwarin û her wekî din, mijara folklore ye. Ji bo peyva folklorê "zargotin" jî tê bikaranîn lê zargotin awayê bêjeyê ye.
Folklor mêjûyê gel e (wek pêşiyên me gotine: "Kevn e pîr e, ji gotinê re bîr e.") û mêjû jî bi awayekî kolektif hatiye avakirin ji ber vê jî ji bo nasîn û danasîna gel çavkaniya herî girîng e.
Ji ber ku agahiyên nivîskî yên dîrokî an jiyana civakî ya kevn li ser Kurdan li gor gelên din kêm in divê Kurd folklora xwe baş binirxînin û bi awayekî xurt binivîsin. Ji bo ku xwe baştir nas bikin. Civakeke ku folklora xwe baş nas neke, lê xwedî dernekeve û dewlemendtir neke feqîr dimîne. Folklor ne tiştekî ku xelas bûye. Ji mêj ve hatiye û hîn jî zîndî ye.
Kurd xwedî folkloreke gelek dewlemend in. Serdestên Kurdan (bi pirranî bakûr) xwestine bibin xwediyê vê folklorê û gelek berhemên zargotinî kirine malê xwe. Dema meriv li xebatên wan dinere dibîne ku li gundên Kurdistanê geriyane û çîrok, metelok, stran û hwd. berhev kirine û li ser navên xwe weşandine. Ne bes zargotina Kurdan gelek xwarin vexwarinên Kurdan jî wek yên wan bin xwedî lê derdikevin. Ango kesên ji peyva "Kurd" aciz jî hay ji folklora Kurdan heye û dizanin çiqas dewlemend e lê mixabin em hîn jî girîngiya folklorê weke dixwaze tênegihiştine.
Ji bo giringiya folklorê minakek pir baş "Destana Kalavela" ya Fîniyan e. Fînî ji bo vê destanê berhev bikin wek seferberiyekê îlan dikin û bi salan bi awayekî piralî gund bi gund digerin, her ozanê ku vê destanê dizane guhdarî dikin û heman destanê cure/cure didin hev. Ev destan ji bo hişyarbûna hestên neteweyî li Fînlandiyayê gelek girîng e. Mînakek ji Kurdan jî " Destana Kawa" û Newroz e. Serhildana Kawayê hesinkar û agirê ku Kawa vexistiye hîn jî rêya Kurdan ronî dike.
Di ziman de jî folklor ciyekî esasî digre. Ziman û wêje jî ji folklorê sûd digrin. Ziman û wêjeya ji folklor û civata xwe dûr rijî ne, xav in. Çawa folklor bi awayê kolektif hatiye avakirin, ziman jî bi wî awayî ava bûye. Bi neqişandina ziman jî wêje pêk tê. Van salên dawî termînolojiya siyaseta Kurdî pêşketî ye û ji aliyekî ve jî xebatên li ser ziman ne hindik in. Lê xeter ev e ku xebat û ferhenga ziman ne di bin kontrola navendeke xwedî gotin de ye. Û Kurdiya hevpar ava nabe.
Teknolojî pêşketiye û pêdivi bi peyv an termên nû jî heye an ji bo xebatên ziman pedivî bi bikaranîna zimanên din jî heye lê ev nayê ve wateyê ku em her tiştên xwe ji nû ve ava bikin. Ji xwe zimanê me zimanekî dewlemend e. Lêkolîn li ser tiştên di bîr û quncikan de maye derxin holê xebateke hêja ye. Ziman, wêje û bi giştî folklor ji civakê re nebe bingehekî hevpar (Girîngî û parastina axê jî ji bîr nebe) netew ava nabe.
Divê êdî Kurd têbigihên ka em tenê ji bo peyva "Kurd" an ji bo xwedîderketina hebûna xwe xwedî têdokoşin. Heke em li xwedîderkatina hebûnê be digerin divê em têkoşîna herî mezin bi xwe re bidin. Em xwe ji vê bişaftinê xelas bikin.

# Em dagirkeriyê qebûl nakin

***Nerazîbûna li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk zêde dibin. Welatiyên bajarê Qamişlo êrîşên dewleta Tirk yên li ser başûr û rojavayê Kurdistanê şermezar kirin û diyar kirin ku ew dagirkeriya dewleta Tirk qebûl nakin.***






Şêniyên bajarê Qamişlo êrîşên Dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdisatanê û gefên li ser Bajarê Minbicê şemezar kirin û gotin ku ew dagirkeriya Tirkiyê bi tu awayî qebûl nakin.
Welatiyên bajarê Qamişlo êrîşên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdisatanê û kiryarên ne mirovî yên li dijî sivîlên Efrînê, her wiha gefên rojane yên li ser Minbicê bi tundî şermezar kirin.
Dayika bi navê Xezal Mihemed a 70 salî derbarê mijarê ade nî ziman ku armanca Tirkiyê ji dagirkirinê, şikandina îradeya gelan e û wiha got: "Em dixwazin bi azadî, bi zimanê dayîkê bijîn. Lê Dewleta Tirk dijminahiya xwe li hemberî me didomîne, em ê jî bi hêza xwe ku bingeha xwe ji fikrê Ocalan digire li hemberî wan şer bikin."
Dayika Xezal, diyar kir ku ew ê ti carî dev ji axa xwe ya ku bi xwîna şehîdan hatiye avdan bernedin.
Welatiyê bi navê Şiyar Elî, nerazîbûn nîşanî dagirkeriya dewleta Tirk da û anî ziman ku dewleta Tirk bi salan şerê gelê Kurd dike, da ku herêmên wan ên bi xêr û bêr dagir bike û ev tişt anî ziman: "Tirkiye dixwaze gelê Kurd tune bike, da ku xêr û bêra wan bidize. Wê rojek were gelê Kurd biserkeve."
Welatiyê bi navê Yeqûb Dawud jî êrîşên li ser Başûrê Kurdistanê şermezar kir û da zanîn ku êrîşên li ser Başûr di heman demê de li Rojava ne û GOT: "Em ê bi rihê şoreşgerî biserkevin û her dem em ê li hemberî dewleta faşist a Tirk têkoşînê bikin û li ber xwe bidin."

## Li Helebê mamoste tên perwerde kirin



Komîteya Perwerdehiya Civaka Demokratîk (KPC-D) li taxa Şêxmeqsûd a bajarê Helebê dewreyeke perwerdehiyê ji 25 mamosteyan re da destpêkirin.
Di çarçoveya amadekariya vekirina dibistanan li gorî rêgezên netewa demokratîk, Komîteya Perwerdehiya Civaka Demokratîk (KPC-D) li taxa Şêxmeqsûd a bajarê Helebê dewreyeke perwerdehiyê ji 25 mamosteyên zimanê kurdî re da destpêkirin.
Di vê dewreyê de mamoste wê li ser waneyên fikrî yên girêdayî girîngiya perwerdehî û rêxistinê, civaka xwezayî, rêbaz û şêwazên danûstandinê, çand û exlaq, şerê taybet, dîroka jinan, jinelojî, dîroka Sûriyê û şoreşa Rojava werin perwerdê bibînin.
Endama Rêveberiya KPC-D Solcan Ebdo diyar kir ku armanca wan ji vê dewreyê ew e ku mamosteyan di aliyê fikrî de amade bikin da ku karibin perwerdehiyên xwe li gorî netewa demokratîk bidin û civaka xwe bêtir pêş bixînin…*ANHA*

## Şaredariya EL Hemrat xebatên xizmetê didomîne



Şaredariya Gel a devera El-Hemrat a girêdayî bajarê Reqayê sê dergehên li Hemze Nasir ên li ser geliyê Mingilan ku li ba welatiyan xwedî girîngiyeke mezin in, sererast kirin.
Ji ber baran û lehiyên vê dema dawî gelek pirên li gundewarê rojhilatê Reqayê hilweşiyan. Buroya Xizmetguzariyan a girêdayî Şaredariya Gel a devera El-Hemrat sê dergehên li ser geliyê Mingilan ên li Hemze Nasir sererast dike.
Evan her sê dergeh li ba welatiyên gundên rojhilatê Reqayê xwedî girîngiyeke mezin in û çûn û hatina di navbera Hemze Nasir a rojava û Hemze Nasir a rojhilat de peyda dike.
Girêdayî mijarê pîşekarê di Şaredariya Gel a devera El-Hemrat Elî Xelef axivî û wiha got: "me sê pirên li ser gelî sererast kirin. Pira yekemîn Hemze Nasir a rojava bi Hemze Nasir a rojhilat ve girê dide. Pira duyemîn jî heman aliyan bi hevûdu ve girê dide. Pira sêyemîn jî devera başûr bi devera bakur ve girê dide."
Xelef diyar kir ku bi sererastkirina van her sê pireyan çûn û hatina welatiyan hêsan kiriye…*ANHA*

## Sewalvanên Reqayê bi gazinc in



Xwediyên lawir, masî û mirîşkan ji ber buhabûna êm û aşleyên sewalan bi gazinc in û bang li Meclîsa Sivîl kirin ku alîkariya wan bikin.
Ji ber sedemên cûda yên wekî belavbûna nexweşiyên sewalan, buhabûn û sextebûna cûreyên aşle û êmên sewalan, li Reqayê sewaldariyê zirar dîtiye.
Ji bo çareserkirina van pisgirêkan Komîteya Sewaldarî ya Reqayê dest bi çavdêrkirina dermanxaneyên sewalan kir û ji ber giliyên xwediyên sewalan ji bazarên bêserûber, komîte hewl dide bazarek daîmî çêbike.
Serokê Komîteya sewaldariyê Munzir Rifet derbarê mijarê de wiha got: "Me ji bo 63 dermanxaneyên beytarî, 6 depoyên beytarî û 42 mirîşgehan re destûra vekirinê daye."
Sewaldarê bi navê Hemadî El-Hisên derbarê mijarê got: "Em ji Meclîsa Sivîl a Reqayê hêvî dikin ku bazarekî giştî li şûna gelek bazarên zêde ku hatine çêkirin, veke."Bijîşkê Sewalan Ehmed El-Hisên jî li ser mijarê ev tişt anî ziman "Ji ber kêmbûna aşleyên sewalan û ji ber bazarên bêserûber nexweşiyên lawiran zêde bûne."
Endamê komîteya sewaldariyê Mehmûd El-Hemzewî jî derbarê mijarê de ev tişt anî ziman: "Masîvanî ji ber şer, nêçîriya zêde û guhnedana nêçîrvanan zirar dîtiye. Lewra em ê komîteyên çavdêriyê û nasandina nêçîriyê ava bikin".
Her wiha xwediyên sewalan bang li Meclîsa Sivîl a Reqayê kirin ku di peydakirina pêwîstiyên sewalan de alîkariya wan bikin…*ANHA*

## Xwendekarên zanîngehê hatin xelatkirin

Zanîngeha Rojava ya bajarê Qamişlo şahiyek li dar xist û 67 xwendekarên zanîngehê yên serkeftî xelat kirin.
Zanîngeha Rojava ya li bajarê Qamişlo ku ji 8 beşan pêk tê û tê de 175 şagirt tên perwerdekirin, bi armanca xelatkirina xwendekarên serkeftî şahiyek li dar xist. Di şahiyê de 67 xwendekarên serkeftî hatin xelatkirin.
Şahiya zanîngehê bi merasîmekê û deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir. Piştre endamê rêveberiya zanîngehê Mihemed Muslim axivî û pêşwaziya mêvanan kir. Muslim serkeftina xwendekaran pîroz kir û ji hemûyan xwest ku zanista xwe bixin xizmeta civaka xwe.
Di merasîmê de piştî axaftinê helbest û şanoyek ji aliyê şagirtên Beşa Zanyariyê ve hate pêşandan. Di dawiya merasîmê de şahiyek hate lidarxistin.
Şahî bi belavkirina xelatan li 67 xwendekaran bi dawî bû.



## Encam û Piştre



Medeni FERHO

Nivîsa min berî encama hilbijartinê hatiye nivîsandin. Dîse jî, ez bêjim; di hilbijartinê de, serketina Kurdan mecburiyetek e, lê ne encam e. Têkoşîna esasî piştî hilbijartinaê dest pê dike. Di pêvejoya hilbijartinê de, HDP, gel, namzêt, eniya demokratîk û namzêtê serokkomariyê Demîrtaş performansek baş nîşan dan û her dem aştî xwestin. Lewma, her pêşengên Kurd wek Mandêla têne bi navkirin. Mandêla navê aştiyê ye. Ev gotin, ji bo Birêz Ocalan tê bikaranîn. Di vê hibijartinê de, ji bo Demîrtaş jî hate bikaranîn. Mandêlayên Kurd zêde ne: Kurd, li gorî "Beyannameya Gelê Demokratik" ya Birêz Ocalan haraket dikin û aştîxwaz in. Aştiya li Tirkiyê jî ne hêsa ye. Ji ber ku faşîzma li Tirkiyê, kesk-sor nobetê diguherin... Divê faşîzma Tirkî, bi hemû rengên xwe têkbiçe. Ji bo vê jî, "şertê nebê nabe" azadiya Birêz Ocalan û girtiyên azadiyê ye. Kurd, di vê mijarê de bi biryar in: Di 25ê Hezîranê de nobeta li Strasbourgê, bi slogana "Ji Ocalan re azadî", 6 salan temam dike, dikevê sala 7mîn. Nobeta herî dirêj ya cîhanê ye. Kurd aştîxwaz in, lê nirxên xwe jî diparêzin. Lewma, nobet û hilbijartin dîrekt li dijî komploya navneteweyî, li dijî sîstema Imralî ne. Lewma, serketina di hilbijartinê de, ne encama dawî ye, lê hamleyek e dîrokî ye û wê deriyê demokrasî vekirî bihêle. HDPe, projeya "gelê demokratîk" e, divê xwedî giranî bin û parlamento, di pirsgirêkê de bikin xwedî înîsîyatîf. Ev hilbijartin, ligel vê yekê, defactoya Bakurê Kurdistanê jî misoger kir. Defecto giring e û ev hilbjartin, îradeya gel nîşan da, li hemberî zor û kiryarên faşîzan, kuştin û wêrankirinê, gel îradeya xwe danî holê: Îradeya ge, defacto ye!... Defacto, yanî îradeya gel, erêkirina "Beynanameya Gelê Demokratîk" ya Birêz Ocalan e. Ev beyanname wê li herêmê riya çemê dîrokê biguhere. Divê, encama vê hilbijartinê, Dewleta Tirk mecbur bike ku vegerê Mutabaqata Dolmabahçe. Divê Parlamena Tirkiyê "Beyannameya Gelê Demokratîk" erê bike. Divê şandeya dewletê, di şertên Ocalan de, bi Birêz Ocalanê re li ser maseya aştiyê rûne. Barê Kurdan jî, ya gelê Tirk jî giran e. ji ber ku Erdogan, Tirkiyê kiriye tariyê û di riyeke şaş de derxistiye rê. Ji bo ku, Tirkiyê wegerê mêjiyê "musawatwekhevi" gelek kar divê. Erdogan, Tirkiye vegerandiye serdema "cehiliyê"... Ev jî bêferhengî ye. Bêferhengî, cehalet û xeşîmî ye. Di dawiya sedsala bîstan û destpêka sedsala bîstûyêkê de, "mêjiyê serdemê" Birêz Ocalan derkete holê. Bi saya mêjiyê sedsalê, Kurd hem ji xeşîma tarî rizgar bûn, hem ji gêjî, tevizandin û erdheja têkçûnê rizgar bûn; hem li dora "lewheyên hevpar" kom bûn. Erdogan xeşîm e, zewatên li dora wî jî yan xeşîm in, yan jî "ehlê filûs"in. Xwestin Tirkiyê wek dewletek kapîtalîst û emperyal nîşan bidin. Dîtinek xwexapandin û pif'dayî bû. "Sahîh"e ku dewleta Tirkkiyê dagirker e, lê ne kapîtalîst e û ne jî emperyal e. Ji bo bibe kapîtalîst, divê xwedî kapîtal be, ji bo bibe emperyalîst divê endustriyel be. Lê her du jî li cem Dewleta Tirk nînin. Bi saya Erdogan, ambarkirina nijadperestî hate kirin. Ev jî tê wateya ambarkirina komên çete û reçeteya paş de vegerê ye, ketina xeşîma tarî ye. Reçeteya Erdogan, red-î diyalektîkê ye û destîniya felaketê ye. Birêz Ocalan, ji bo paşerojên Tirkiyê û Kurdistanê reçeteya diyalektîkê amade kir. Ev reçete giha qonaxa Mutabaqata Dolmabahçe. Her kesî, ev reçete wek ronîkirina paşerojan û vekirina pêşiya Tirkiyê nirxand. Kurdan jî, reçeteya Ocalan qebûl kiriye; li gorî herka dîrokê û formulekirinek diyalektîkê, li dijî destîniya felaketê têkoşînê dikin. Lewma, têkoşînek dijwar li pêşiya Kurdan e.



# Jin bi komînan tên cem hev

***Jinên li Helebê li derdora komînan rêxistinkirina xwe pêşdixin. Jinên endamên komînan diyar kirin ku bi pêşxistina çand û xebatên komînan re ew civakeke nû ava dikin. Jinan wiha got, "Di heman demê de komîn ji bo me bûye cihê perwerdeyê. Jin li komînan xwe ji zênhiyeta paşverû yên civakî rizgar dikin."***

Gelek jinan bi rêya naskirina fikr û çandên azad û pêşxistina hişmendiya xwe û wergirtina perwerdeyên fikrî, karibûn xwe ji qeydên civakî yên paşverû ku li ser wan hatibûn ferzkirin, rizgar bikin.
Jinên taxa Şêxmeqsûd di xwe rizgarkirina ji zîhniyeta baviksalar û desthilatdar de ji destpêka aloziya Sûriyê ve pêşengî bi roleke pêşeng rabûn. Jin ji destpêka aloziya li bajarê Helebê ve beşdarî xebatên parastina taxên xwe bûn û saziyên xwe yên taybet ava kirin. Her wiha bi lehengî li dijî komên çete beşdarî berxwedanê bûn.
Şêrîn Elî bi temenê xwe 39 salî ye û yek ji jinên ku karibû cihê xwe di nava komîn û saziyên jinan de bigire, rola xwe di avakirina civaka xwe de îspat bike û her wiha diyar bike ku stûna sereke ya avakirina civakeke demokratîk jin in.
Şêrîn Elî beriya ku fikrên azadiya jinan ên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nas bike jiyana xwe bi bîr anî û diyar kir ku jin rêberên civakê ne û wiha got: "Min her tim xwe azad didît û baweriya min der barê mijara azadiya jinan de şaş bû".
Şêrîn Elî di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku li ser israra hevaleke wê ew beşdarî komîneke jinan bûye û piştre cihê xwe di rêveberiya komînê de girt û wiha dewam kir: "Di destpêkê de gelek astengî derbarê pênasekirina komînê de li pêşiya min derketin û ji bo min rola rasteqîn a komînê di civakê de ne zelal bû. Lê piştî çend mehan min rastiya komînê nas kir û min karibû bi rêya wê peywendiyê bi gelek jinan re bikim û wan beşdarî komînê bikim da ku ew jî karibin xwe bi rêxistin bikin."
Şêrîn Elî dibêje ku wê felsefeya Rêber Ocalan di mêjiyê xwe de çandiye û di vê derbarê de wiha got: "Êdî min rola komînên jinan di birêxistinkirina jinan de nas kir da ku rastiya jinan derkeve holê. Girêdayî vê yekê min felsefeya Rêber Apo bêtir nas kir û ez beşdarî gelek perwerdeyên fikrî bûm û waneyên ku min di perwerdeyan de werdigirtin min di jiyana xwe de dimeşandin." Şêrîn Elî destnîşan dike ku kesayeta wê bi awayekî berbiçav hatiye guhertin û ew di demên borî de ji berpirsyariyê ditirsiya, lê niha ew dikare serbest bi jinan re zîhniyeta şaş gotûbêj bike û felsefeya azadiya jinan bide naskirin.
Mewlûde Umer ya 42 salî endama Komîna Şehîd Sewsen e. Mewlûde Umer diyar kir ku wan bê hêvî jiyana xwe derbas dikir û wiha got: "Min rastiya xwe nas nedikir. Jiyana min tenê di çarçoveya malê û cîranan de bû û tenê xizmeta zarokan bû. Lê piştî ku ez beşdarî komînê bûm, min gelek jin nas kirin. Min dît ku ez di xewneke bêwate de bûm."
Mewlûde Umer dibêje ku wê bi rêya komînê fikr û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a derbarê azadiya jinan de nas kiriye û wiha dewam kir: "Ez ji cîhanekê derbasî cîhaneke nû bûm. Êdî jiyana min bi wate bûye."
Di dawiya axaftina xwe de Mewlûde Umer bang li hemû jinan kir ku beşdarî komînên jinan bibin û asta têkoşîna xwe ber bi azadiya jinan ve bilind bikin û xwe ji hişmendiya baviksalar û desthilatdariyê rizgar bikin…*ANHA*




## Festîvala Zîlan bi dawî bû



Li bajarê Dortmûnd ê Elmanyayê 14'emîn Festîvala Jinan a Zîlan bi dawî bû. Di festîvala ku hezaran kes li hev kom bûn de Parlemetera HDP'ê ya Sêrtê Besîme Gonca axivî û got: "Em ê sibe AKP'ê di sindoqan de bifetisînin."
14'emîn Festîvala Jinan a Zîlan a ji bo bîranîna Avesta Xabûr û Barîn Kobanê bi dirûşma "Parastina Efînê Parastina Şoreşa Jinê ye' hatibû lidarxistin bi dawî bû. Festîvala ku bi hezaran jin tevlî bû, di axaftinên hatin kirin de bal hate kişandin ser hilbijartina 24'ê Hezîranê û hate gotin ku wê AKP'ê di sindoqan de bifetisînin.

### EM Ê BIBIN LAYIQÎ SARAYAN

Koordînasyona Komelên Jinên Kurdistan (KJK) a peyamek ji bo festîvalê şand, bal kişand ser berxwedana jinan û ev tişt hate gotin: "Desthilata faşîzma AKP-MHP'ê ji bo desthilata xwe mayîn de bike biryara hilbijartina pêşwext girt. Êrîşa li ser Efrînê, tecrîda li ser Rêber Apo, hewldana dagirkeriyê ya li ser Başûrê Kurdistanê û dijminahiya Kurd parçeyek ji vê planê ye ku dom dike ye. Ji bo vê li her derê li dijî vê faşîzmê têkoşîn kirin weke deynekê dibînin. Divê gelê me yên li Ewropa di zanbûna vê de bin û bi vê rêbazê têkoşîn bikin. Çawa ku gelê me di berxwedana Efrînê de tişta ku kete ser milan kir, ji niha û şûn ve jî tişta ku bikev ser mila wê bike. Bê şik û guman rola jinan a di vê mijarê de diyarker e û divê rola xwe bilîze. Divê laqîqî têkoşîna di pêşentiya Sara, Rojîbîn û Ronahiyan de hate kirin bin. Dema ku em bûn layîqî şehîdên xwe wê demê em serketine."

### RÊBERTIYA XWE SILAV DIKIN

Parlemetera HDP'ê ya sêrtê Besîme Gonca jî jinên li dijî faşîzmê têkoşîn dikin silav kir û diyar kir ku gelê Kurd ev sed sal in li dijî faşîzmê li ber xwe didin û ev tişt got: "Di dîroka Kurdistanê de bi qehremaniyên ku li dijî faşîzmê têkoşîn kirine tije ye. Rêbertiya xwe yê ku pêşentî ji vê têkoşîna me re kirî ku ev 19 sal in di Girava Îmraliyê de tê ragirtin silav dikim. Ji bo hilatina rojê ya sibe têkoşînê dikin. Em ê sîstema AKP'ê ya ku Cizîr, Sûr, Nisêbîn û Geverê talankir, hilweşînin û di sindoqan de bifetisînin. Bi milyonên ku biçin ser sindoqan wê qedera Tirkiyeyê bide guhertin. Divê her kes biçe ser sindoqan û vîna xwe ya rizgarbûna ji vê faşîzmê nîşan bide. Biçîn ser sindoqan û AKP'ê di sindoqan de bihêlin."
Li ser navê komeleya mexdûran ê di demê rejîma Nazî ya Elmanyayê de zirarên mezin dîtine Monîka Sctrcte jî axivî. Sctrcte bal kişand ser pêkanînên rejîma Nazî ya li ser gelan û got: "Îro kiryarên dijibe wê li Tirkiyeyê ji aliyê Erdogan ve tê kirin."
Her wiha di festîvalê de li ser navê Kongreya Star jî peyamek hate şandin. Di peyamê de hate gotin ku wê têkoşîna Zîlanan di roja me ya îro de li Rojava dewam dike.
Piştî axaftinên hatin kirin û şûnde, hunermed Jala, Sena Dersim, koma muzîkê Silbîs û Tarî, Îpek Recber stran gotin û ciwana govend gerandin. Dîsa koma Govendê ya TEV ÇAND'ê jî govendên gelerî pêşkêş kir.
Festîval bi gerandina govend û dirûşman ve bi dawî bû.

## Aborî û siyaset bi beşdarbûna jinan wê pêş bikeve



Hevseroka Konseya Karên Civakî ya Efrînê Arîfe Bekir derbarê rola jinê ya di aborî û siyasetê de axivî û diyar kir ku jina kurd her dem bi jêhatîbûna xwe derketiye pêş û got: "Karê aborî û siyasetê bi beşdarbûn û hêza jinê wê pêş bikeve."
Hevseroka Konseya Karên Civakî ya Efrînê Arîfe Bekir derbarê rola jinê ya di aborî û siyasetê de anî ziman ku di dîrokê de her dem jinê di nav karê aborî û siyasetê de cihê xwe girtiyê û serkefinên mezin bi dest xistiye.
Arîfeyê bal kişand ser bandora Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a li ser jinê û got: "Rêber Apo her rola jinê ya girîng a di nava hemû qadên civakî de parastiye."
Arîfeyê anî ziman ku jin dema ku karekî dike tenê berjewendiyên xwe nafikirin û ev yek ji bo rola jinê ya di siyaset û aboriyê jî derbasdar e û wiha dewam kir: "Yên bi hezar sal berê hîmê bingehîn ê birêvebirina civakê ava dikir dîsa jin bûn. Her wiha jina Kurd piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê jî di qada aborî û siyasetê de bû xwedî rolek girîng. Rol û misyona girîng a jinê ku piştî Şoreşa Rojava derket pêş elbet bandora fikir û ramanên Rêber Apo jî gelek heye. Jina Kurd di sîstema birevebirinê ya Rojavayê Kurdistanê de xwedî rolek girîng e ev jî bandorek erênî li ser civakê dike. Di heman demê de bandorek erênî li ser xizmeta civakî jî dike. Dema di qada siyaset û aboriyê de jin ne xwedî rolek sereke be dê civak têk biçe."Hevseroka Konseya Karên Civakî ya Efrînê Arîfe Bekir wiha dawî li axaftina xwe anî: "Em ê heta dawî wekî jin xwedî li keda xwe û li fikrên Rêber Apo derkevin."…*JINNEWS*

## Nahêlin Zeynep Celaliyan derman bibe



Saziya Efûyê ya Navneteweyî di 15'ê Hezîranê de li ser rewşa Zeynep Celaliyan daxuyaniyeke nivîsî weşand û diyar kir ku dermannekirina Celaliyan tê wateya êşkenceyê.
Saziya Efûyê ya Navneteweyî di 15'ê Hezîranê de li ser rewşa Zeynep Celaliyan daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku dermannekirina Celaliyan tê wateya êşkenceyê.
Di daxuyaniya Saziya Efûyê ya Navneteweyî de ev tişt hatin diyarkirin:
"Ji bo ku Zeynep Celaliyan neçe saziya tendirustiyê û nexweşxaneyê rayedarên Îranê astengiyan çêdikin û êşkenceyê dikin. Zeynep Celaliyan di zindana Xoyê ya Ûrmiyeyê de ye û rewşa wê ya tendirustî ber bi xerabiyê ve diçe. Celaliyan nexweşiyên wê yên giran hene û destûr nayê dayîn ku were dermankirin. Xebatkarên tendirustiya zindana Xoyê diyar kirine ku, ji bo îltîhaba giran a di dev û diranê wê de divê sewqî nexweşxaneyeke derveyî girtîgehê were kirin lê rêveberiya girtîgehê ev daxwaz red kirine."
Di serê vê mehê de Zeynep Celaliyan nameyek şandibû. Celaliyan diyar kiribû ku ew 11 sal in di girtîgehê de ye û gotibû ku, "Ez mecbûr im li hemberî van êşan tehemul bikim. Ji ber ku ez girtiyeke siyasî me, tu mafên min bi cih nayê û ez ji êşên xwe re dibim derman. Ligel ku rêveberiyê ez nebirime ser bijîşkan jî, li ser medyaya xwe diyar dikin ku wan ez birime ser bijîşkan."

## Kurd bi komkujiyan tune nabin



Di 25'ê Hezîrana 2015'an de çeteyên DAÎŞ'ê êrîşî Kobanê kiribûn û komkujî pêk anîbûn. Şahida komkujiya Kobanê Zergê Şêx têkildarî komkujiyê got: "bi komkujiyan wê nikaribin Kurdan tune bikin."
Di 25'ê Hezîrana 2015'an de çeteyên DAÎŞ'ê êrîşî Kobanê kiribûn û komkujî pêk anîbûn. Şahida komkujiya Kobanê Zergê Şêx Mehmûd ku xarziya wê Jiyan di komkujiya Kobanê de jiyana xwe ji dest dabû, axivî û wiha got: "Em ê tu carî kesên ku di komkujiyê de jiyana xwe ji dest dan ji bîr nekin û axa xwe ya ku bi xwîna şehîdên me hatiye avdan biparêzin."
Zergê got: "Dema ku dengê çekan hat em derketin derve, me dît ku DAÎŞ guleyan bi ser gel de dibarîne. Xarziya min jî birîndar bûbû. Lê Jiyan çeka bavê xwe girt û li dijî çeteyan şer kir. Wê bi wêrektiyek mezin bersiv da çeteyan û jiyana xwe ji dest da."
Zergê da zanîn ku ew jî di komkujiya Kobanê de birîndar bûbû û wiha dewam kir: "Ez jî bi awayekî giran birîndar bûbûm. Biraziyên min hatin min ji Kobanê derxistin û birin nexweşxaneya Bakurê Kurdistanê. Ji bo komkujyên bi vî rengî careke din dubare nebe divê em hêza xwe bikin yek û li dijî dagirkeran xwe biparêzin. Hêza me û têkoşîna me dê ji êrîşan re bibe bersiva herî xurt."Zergê Şêx Mehmûd diyar kir ku ew bi dilekî germ kesên ku di komkujiyê de jiyana xwe ji dest dan bi bîr tîne û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Neyarên me dibêjin qey gelê Kurd dê bi kuştinê biqedin û li çar parçeyên Kurdistanê êrîşî me dikin. Lê em Kurd qet naqedin emê her hebin û liberxwe bidin."… *JINNEWS*

# Efrîn wê rizgar bibe û dagirkerî têk biçe

*Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê bi wesîleya salvegera sêyemîn a komkujiya Kobanê daxuyaniyek weşand. TEV-DEM'ê di daxuyaniyê de wiha got, "Em soz didin gelê xwe ku wê Efrîn were rizgarkirin û wê gelê me bi awayekî bi rûmet vegera ser axa xwe. Berxwedana me bi hemû rêbazan didome. Wê serkeftin bibe ya me û dagirkerî têk biçe."*



Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê di salvegera sêyemîn a komkujiya Kobanê de soz da ku dê Efrîn were rizgarkirin û şêniyên Efrînê wê vegerin ser xaka xwe.
Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê bi boneya salvegera komkujiya Kobanê daxuyaniyek da û diyar ku ew ê tekoşîna xwe ya ji bo têkbirina dagirkeriya Tirk û çeteyên wê bi hemû hêza xwe bidomînin.
Daxuyaniya TEV-DEM wihaye:
Salvegera sêyemîn a komkujiya Kobanê ye ku di 25'ê Hezîrana sala 2015'an de li dijî gelê me yê kantona Kobanê pêk hat. Komên çete yên girêdayî DAIŞ'ê ku bi awayekî vekirî ji aliyê rêjîma Tirkiyê ve têne tevgerkirin komkujiyek hovane li dijî sivîlên Kobanê pêk anîn. Di encamê de derdora 600 welatiyên sivîl şehîd û birîndar bûn. Piraniya qurbaniyan zarok, jin û kesên bi temen in.
Em vî sûcê ku li dijî mirovahiyê û gelê me yê kantona Kobanê pêk bat şermezar dikin. Rizgarkirina Kobanê û serkeftina wê ya dîrokî bû pêngaveke dîrokî ji tevgera gelê kurd re, her wiha bû derbeya ku li pişta teroristan ket. Di heman demê de bû nimûneya berxwedanê û nirxên jiyana hevbeş a ku tevî hemû plan û lîstokên hatin kirin, biser ket.
Bi dagirkirina Efrînê jî derket holê ku bi her awayî derfetê didin terorsîtan. Li Efrînê gelê Efrîn, şervanên YPG/YPJ'ê berxwedanek pê hempa nîşan dan. Dewleta Tirk bi dagirkirina Efrînê hişt ku çeteyên DAIŞ'ê careke din nefes bigirin.Bi boneya salvegera komkujiya 25'ê Hezîranê em hemû şehîdên xwe bi bîr tîninl. Em careke din soz didin ku em ê ji pêkanîna armancên şehîdên xwe gavan paş de navêjin. Heta pêkanîna armancên wan û dawîkirina dagirkeriya Tirk ji herêmên me, her wiha têkbirina hemû hêzên çeteyan ku dijberiya mirovahiyê û hemû projeyên demokratîk dikin, em ê xeta wan bidomînin.Em careke din soz didin gelê xwe ku wê Efrîn were rizgarkirin û wê gelê me bi awayekî bi rûmet vegera ser axa xwe. Berxwedana me bi hemû rêbazan didome. Wê serkeftin bibe ya me û dagirkerî têk biçe."

## Êdî gel ji Erdogan natirsin



Siyasetmedarên li Ewropa encama hilbijartina li Tirkiye nirxandin û diyar kirin ku li Tirkiyê demokrasî ketiye talûkeyê. Siyasetmedaran anîn ziman ku Erdogan gotina xwe ya "Demokrasî tramvay e. Heta ku cihê tu biçe diçe jê peya dibe." pêk anî.
Li Tirkiyê encama hilbijartina 24'ê Hezîranê ya ne fermî eşkere bû. Siyasetmedarên li Ewropa encama hilbijratina li Tirkiyê nirxandin. Li gorî nûçeya DW Tirkî siyasetmedarên li Ewropa diyar kirin ku bi vê encamê demokrasiya Tirkiye bêtir ketiye talûkeyê.

**NE AZAD Û NE JÎ ADÎL E**

Wekîla Serokê Koma Partiya Çep a Almanya Sevim Dagdelen, encama hilbijartina li Tirkiyê ya Serokomarî û Parlamenteriyê nirxand. Serokê Koma Dostaniyê ya Navbera Parlamentoyê ya Alman û Tirk a Meclîsa Federal Dagdelen, ji bo hilijartinê got, "Ev hilbijartin ne adîl e û ne jî azad e. Beriya hilbijartinê bi nûçeyek manipulasyonê Erdogan, gihişt hedefa xwe ya otoriter a pergala Serokomariyê. Dagdelen got: "Tirsa ku Erdogan TirkiyÊ ber bi pêvajoyek xerabtir de bibe zêde ye."

**DIBE KU ERDOGAN DEST JI ÎKTÎDARÊ BERDE**

Hevserokê Giştî yê Partiya Keskan Cem Ozdemir jî Tirkiyên li Almanya yên beriya encama hilbijartinê diyar bibe serkeftina hilbijartinê pîroz kir rexne kir û got: "Alîgirên Erdogan ên ev pîrozbahî pêk anîn, tenê pêşandana kêfxweşiya otokratan nake. Di heman demê de demokrasiya liberal jî red dikin. HDP ji sedî 10 bend derbas kir. Encamek baş stend. Ev nîşan dide ku êdî gel ji tirsa Erdogan natirsin. Gelek mirov ji rejîma tirsê ya Erdogan of bûne. Ger ku ev hilbijartin adîl pêk hatibûya dibû ku Erdogan dest ji vê îktîdarê berdaya. Divê êdî CHP û HDP rejîmê bêzar bike û rohahiya demokrasiyê li Tirkiyê zêdetir bikin."

**TEVGERA MERKEL ŞERM E**

Serokê Koma Meclîsa Partiya Alternatif a ji bo Almanya populist a Rast (AfD), Alice Weidel jî bertek nîşanî encama hilbijartina Tirkiye da. Weidel, diyar kir ku li Tirkiye di bin talûkeyê de ye. Parlamentarizm û demokrasî di bin talûkeyê de ye. Tayyip Erdogan çend sal berê di axatina xwe de gotibû: "Demokrasî tramvay e. Heta ku cihê tu biçe diçe jê peya dibe." ev talûke ye. Nifûsa Osmaniya Nû dê zêdetir bibe. Seroka Alman Angela Merkel her dem piştgiyiyê dide Tirkiyê. Ev rewşa şermê ye."

## Em rê nadin aramiya herêma me têk here




Şêx û rûspiyên herêma Reqayê piştgiriya xwe ji QSD'ê re anîn ziman û diyar kirin ku ew rê nadin ku hewldanên tevliheviyê bi serkevin. Şêx û Rûspiyan daxwaz ji Konseya Ewlekariyê û Neteweyên Yekbûyî kirin ku dimildest mûdaxeleyê bike û dagirkeran ji axa Sûriyê derxînin.
Bi dehan şêx û rûspiyên herêma Reqayê derbarê buyerên dawî ku li herêmê derketine û hewldanên têkbirîna aramiya herêmê de daxuyanî dan.
Daxuyanî li çerxeriya El-Neîm ji aliyê şêxê eşîreya El-Şibil Emar El-Hamî ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de wiha hate gotin; "Bi navê êlên Reqa û gundewarên wê, bajarê Reqa û gundewarên wê û parêzgeha Dêrazor ta sînorên Iraqê ji çeteyên DAIŞ'ê bi bedelên giranbuha, bi xwîna keç û xortên herêmê ji çeteyan hate rizgarkirin, piştî rizgarkirinê şêniyên herêmê vegeriyan warên xwe û ji nû ve jiyana xwe geş kirin. Em naxwazin ti aliyek destdirêjî ewlekariya Reqa û gundewarên wê her wiha tevahî Bakurê Sûriyê bike. Li ser vê yekê em wiha dibêjin:
1-Qedexeye ewlehiya parêzgehê û gundewarên wê û tevahî xaka Bakurê Sûriyê were pê lîstin.
2-Şêx û rûspiyên êlan biryar girtine ku kesê/a ku bi aramiya herêmê bilîze û tevliheviyê di navbera pêkhateyên Bakurê Sûriyê de derbixîne û îdîayên derew belav bibe, ji herêmê were qewitandin.
3-Şêx û rûspiyên herêmê dibînin ku çareseriya siyasî çareseriya herî guncave ji bo aloziya Sûriyê, çareseriya leşkerî wê ji bilî wêrankirinê encamên baş negire.
4-Şêx, rûspî û tevahî pêkhateyên Bakurê Sûriyê tekez dikin ku ew piştgiriyê didin Hêzên Sûriya Demokratîk û wê destkeftiyên gelê Bakurê Sûriyê biparêzin.
5-Şêx û rûspiyên Reqayê daxwaz ji Konseya Ewlekariyê û Neteweyên Yekbûyî dikin ku Tirkiyê û çeteyên wê ji axa Sûriyê derxînin."

## Em êrîşên li erdên Iraqê red dikin



Li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk li ser xaka Iraq û Başûrê Kurdistanê Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî li gel Desteya Wezîran civiya û ji bo pêşîgirtina êrîşan çend biryar girtin.
Êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li ser xaka Başûrê Kurdistanê û Iraqê bê navber berdewam dikin. Li ser dagirkeriya dewleta Tirk roja 24'ê Hezîranê Desteya Wezîran a Iraqê bi serokatiya Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî civiya.
Piştî civînê têkildarî naveroka civînê ofîsa Serokwezîrtiyê daxuyaniyek da û wiha hate gotin; "Têkildarî binpêkirina sînorên Iraqê ji aliyê Tirkiyê ve nîqaşek berfireh hate kirin. Di civîna li ser dagirkeriya Tirk de ku Wezareta Parastinê, Parêzvanên Sînor, Wezareta Parastina Hewayî û Wezareta Derve yên Iraqê amadebûn, guftûgoyên giring hatin kirin. Hemû cûrên êrîşên li ser xaka Iraqê em red dikin. Ji bo pêşîgirtina li derbaskirina sînor û êrîşên li ser xaka Iraqê çend rêze biryar hatin girtin.
Ji bo pêşîgirtina êrîşan wê xebat bên meşandin
Ji bo pêşîgirtina li binpêkirina sînoran bikaranîna rêbazên dîplomasî. Komîteya operasyona hevbeş û artêşê, komîteya îstixbarat û ewlehiyê ya Wezareta Parastinê, Şêwirmendiya Ewlehiya Netewî ya hêzên hindir û sînor têkildarî êrîşan demek herî kurt de wê rapor û pêşniyarên xwe amade bikin. Raporên bên amadekirin wê cardin bêne destgirtin."



## Em ê giya bixwin lê terka axa bav û kalê xwe nekin

Qasim ENGÎN

Beriya salan hem jî gelek salan, welatek bi navê Vîetnam ji aliyê hinek dewletên dagirker ve hatibû dagirkirin. Welatê wan wêran kirin. Talan kirin. Bi avakirina nêzî 17.000 gundên stratejîk, Vîetnam çol kirin. Bombe kirin. Kîmya barandin. Bi mîlyonan Vîetnamî qetilkirin.
Nokerên wek Dîem yên profesyonel ji xwe re xebitandin. Cahşîtî pêşxistin. Hewldan civaka Vîetnamê perçe perçe bikin. Vîetnamî birçî hiştin. Tî hiştin. Axa wan şewitandin.
Bi êşkence û lêdan xwestin Vîetnamiyan dîl bigirin, teslîm bigirin. Zindanek wek Saygon avakirin da ku ji bo Vîetnamiyan bibe cihê çav tirsandinê, bibe cihê serî tewandin û stûxwariyê.
Lê Vîetnamiyan serî netewandin, teslîm nebûn. Birçî man, tî man, tazî man. Lê stûyê xwe li ber dagirkeran netewandin. Gavek paşde neavêtin. Berovajî; bi bawerî, bi vîn, bi hêvî, bi wêrekî, bi fedakarî, bi berxwedanî, bi çalakî, bi yekbûyî, bi rêxistinî, bi şer, bi Şerê Gelê Şoreşgerî, bi tevahî hêza xwe li berxwedan û li hember dagirkeran sekinîn.
Erê, tevî ku erîşên hêzên dagirker pir bêrehmbûn, pir bêîmanbûn, pir zêde derveyî mirovî jî bûn, Vîetnamiyan li berxwedan, axa xwe neterikandin, welatê xwe çol nekirin.
Erê, tevî ku li ser her metre çargoşe axa wan bi hezaran ton TNT ango Dînamît barandin, dîsa Vîetnamiyan gavek jî paşda neavêtin û ji bo ku dagirkeran ji axên bav û dayikan bicehimînin bi îmanek gelek mezin têkoşan û encamê de dagirker-berdêlên xwe giran jî bibin- qewitandin, ji welatê xwe derxistin.
Lê em ji bîr nekin ku, li pişt vê qewitandin û qewirandina dagirkeran de ferasetek hebû, feraseta welatparêziyê. Feraseta parastina axa xwe. Axa bav û dayikên xwe. Feraseta evîndariya welatê xwe û nefreta ji dagirkeran û dagirkeriyê.
Bêyî ku em dirêj bikin:
"Gelê min her tim li vir bû. Bavê min, bavê wî û bavê bapîrê min û bi qasî ez bijmêrim hemû.
Îblîsên Yankê, bombeyên wan, guleyên wan û tankên wan; goristanan perçe jî bikin, hastiyên wan li vir, bin axê de ne. Ezê li vir bijîm û li vir şer bikim.
Eger ez bi bombeyan an jî gulêyên Yankê bimrim, herî kêm hastiyên min li cem hastiyên bav û kalên min wê li heman axê bimînin…
Em xelkên Cu Chî'nînin, em ê giya bixwin, em ê kokê daran bixwin, eger pêwîst bibe em ê axê jî bixwin. Lê em ê tu caran axên bavên xwe neterikînin. Em, kûrên me, heta neviyên me, heya ku dagirker bicehimin em ê li hember wan şer bikin." Erê, îro tam jî ev dem e ku; em, kûrên me, neviyên me, bi gotinek din tevahî gelê Kurd û ciwanên xwe li hember dagirkerî dakevin qadan û li hember ewqasî hovîtiya dagirkerên faşîzan êdî, bê wirde û virde, têbikoşin!
Bi hêviya; evîndariya welatê xwe û nefret ji dagirkeriyê, em têbikoşin!



# Tevî zextan jî serkeftina mezin

*Li bakurê Kurdistanê û Tirkiyê di 24'ê hezîranê de hilbijartinên pêşwext yên serokkomariyê û parlemenê hatin lidarxistin. Bi mîlyonan hilbêjir di bin rewşa awarte û bi taybet li Kurdistanê di sîya çekan de çûn ser sandoqan. Tevî hemû êrîşan jî HDP'ê benda hilbijartinê derbas kir û bi 68 parlementer ket meclîsê.*



HDP'ê di hilbijartinên 24'ê hezîranê yên li Tirkiyê de benda %10 derbas kir û li gor encamên nefermî li seranserê Tirkiyê û bakurê Kurdistanê 67 parlamenter bi dest xistin.
Tirkiyê 24'ê Hezîranê de , hilbiajrtinên serokomariyê û parlementoyê pêk hatin.
Li gor encamên nefermî, HDP'ê li piraniya bajarên bakurê Kurdistanê bi rêjeyeke bilind biserketiye. Herwiha li çend bajarên mezin ên Tirkiyê yên weke Stenbol û Îzmîrê jî parlamenter derxistiye.
Hejmara parlamenterên HDP'ê yên ku deristine li gor bajaran wiha ne: Amed: 9, Wan: 5, Colemêrg: 3, Şirnex: 3, Sêrt: 2, Mêrdîn: 4, Êlih: 4, Bidlîs: 1, Mûş: 2, Çewlîk: 1, Agirî: 3, Igdir: 1, Qers:1, Dêrsim: 1, Riha:4, Dîlok:1, Stenbol: 12, Hatay: 1, Edene: 2, Mêrsîn: 2, Izmîr: 2, Enqere: 1, Kocaeli: 1 û Antalya: 1.

## Tifaqa faşîst bi hîle yan bi ser ket




Di çapemeniya cîhanê de bi berfirehî hate ragihandin ku Erdogan û tifaqa nîjadperest AKP-MHP bi hîleyan di hilbijartinê de 'bi ser ketine' û hişyarî dan ku rêveberiyeke hîn tund û zehmet li ber Tirkiyê ye.
Di versiyona online ya kovara Der Spiegelê de, bi navê Hasnain Kazim bi sernavê "Serokê heta bi hetayê" şîrove-nûçeyek hate weşandin û işaret bi gelek manîpulasyon, zext û şîdeta dema hilbijartinê hate kirin.
Nûçegihanê Der Spiegelê bi taybetî bal kişand ser zext û zordariya li Kurdistanê û ragihand, destûr nehate dayin ku çavdêr bikevin nava gelek navendên dengdanê. Her wiha diyar kir ku ji bo Erdogan û tifaqa AKP-MHP'ê gelek dengên bi komî hatine dayin û hate gotin, "Li hin navendên dengdanê yên li başûrê rojhilatê welêt ku Erdogan lê nayê hezkirin, mirovên bi çekdar li meydanê bûn."
Di şîroveyê de hate destnîşanirin ku bi ihtimaleke mezin wê Erdogan bi rengekî hîn tund welêt bi rê ve bibe û hate gotin, "Wê bi şêweyekî hîn dijwar ceza li mûxalîfan bibire, wê xwepêşandêr hîn bi şêweyekî giran lêdanê bixwin."

**LE MONDE CIH DA HÎLEYÊN LI BAJARÊN KURDAN**

Di nûçeya rojnameya Fransayê Le Monde de hate ragihandin ku mûxalefetê îtiraz li encamên hilbijartinê kiriye û bal kişand ser hewldana Kurdan a mayina li parlamentê.
Di nûçeyê de dîmenên li Pirsûs û Erzîromê yên dizîna dengan û dayina dengan bi rengekî komî hatin bibîrxistin. Hate destnîşankirin ku li bajarên Kurdan gelek hîle hatine kirin.

**NYT BAL KIŞAND SER GOTINÊN DEMÎRTAŞ ÊN LI SER PAŞEROJA TIRKIYÊ**

Di nûçeya Carlotta Gall a ji rojnameya New York Times (NYT) de hate ragihandin ku beşeke girîng a mûxaledetê, ev hilbijartin weke 'şensê dawî yê ji bo rizgarkirina demokrasiyê' dîtine. Di nûçeya rojnameyê de gotinên Selahattîn Demîrtaş ên li ser metirsiyên li ber Tirkiyê hatin bibîrxistin.
Di nûçeyê de hate ragihandin ku Demîrtaş hişyariya 'wê ji tuneleke tarî derbas bibe' daye û bi vî rengî bal kişandiye ser zor û zehmetiyên di rejîma şexsekî de rû bidin.

**FIGARO: DERBASBÛNA HDP'Ê JI BENDÊ YE CIHÊ KÊFXWEŞIYÊ YE**

Rojnameya Le Figaro jî çavdêriya dengdana li Stenbolê ragihand. Di nûçeyê de hate gotin, HDP'yî ji Stenbolê bi hêvî ne, lê belê hîle û astengiyê li Kurdistanê rû didin, wan dixin nava tirs û fikaran.
Di nûçeyê de hate destnîşankirin, piştî ku Erdogan û tifaqa wî ragihand ku piraniya dengan girtine, 'yekane diyariya ku dilê mirovan xweş dike' derbasbûna HDP'ê ji benda hilbijartinê ye.
Ajansa Nûçeyan a Reutersê jî ji bo Erdogan got, "siyasetmedarê herî populer, lê yê herî zêde civakê parçe dike."

**DER STANDARD: TEORIYÊN KOMPLOYÊ BI BANDOR BÛN**

Rojnameya Der Standard a li Awûstûryayê tê weşandin jî ji bo şîroveya xwe ya bi sernavê "Erdogan çim abi ser ket" diyar kir ku teoriyên komplo yên li ser "hêzên derve" ya jî "dijminên derve" bi bandor bûne. Di şîroveyê de hate ragihandin ku van komployan ser pirsgirêkên rasteqîn nixumandine û hate destnîşankirin ku hilbijartin bi rengekî ne wekhev pêk hatiye.

## 2 hezar û 194 roj in nobedê digirin



"Nobeda Azadiyê" ku çalakiya herî demdirêj a bênavber a gelê Kurd e, dikeve hefteya 313'an. Bû 2 hezar û 194 roj ku bi rengekî bê navber nobed tê girtin.
Nobeda ku 25'ê Hezîrana 2012'an li bajarê Strasbourg ê Fransayê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest pê kir, 6 salan li pey xwe dihêle.
Heta niha bi sedan Kurdistanî, Tirkiyeyî, Asûrî, Elewî, Êzidî, nûnerên saziyên jin û ciwanan, dost û siyasetmedarên Ewropî, sendîkavan, parlamenter, hevşaredar, akademîsyen, hunermend, nûnerên dînî gelek kes tevlî çalakiyê bûne.
Hevserokên Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) û hevserokên saziyên ser bi KCDK-E ve nobeda vê hefteyê îro dewr digirin. Koma qelebalix wê hefteyekê nobedê bigire.
Li aliyekî wê daxwaza azadiya Ocalan bikin, li aliyê din jî hêrsa li dijî bêdengiya saziyên navneteweyî ya li dijî tecrîda girankirî nîşan bidin.
Bi vê çalakiyê re her wiha nêrînên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û têkoşîna gelê Kurd tê nasandin.
Wekî din işaret bi tecrîda girankirî ya li ser Ocalan tê kirin û zext li saziyên navneteweyî tê kirin ji bo bikevin nava liv û tevgerê.
Çalakiya nobedê ku hefteyê heft rojan didome, 6 salan li pey xwe dihêle. Organîzatorên çalakiyê bi biryar in ku çalakiya nobedê heta azadiya Ocalan bidomînin.
Her hefte 4-5 kes nobedê digirin û bi vî rengî hejmara nobedaran heta niha gihîştiye 1.500 kesî.
Çalakî di nava her şert û mercî de, li gel berf, baran û germa zêde her roj saet navbera 07:30 û 16:30'î dewam dike.
Heta niha bi deh hezaran kesî re hevdîtin hatiye kirin û bi sed hezaran belavokên bi zimanên Îngilîzî, Elmanî û Fransî hatine belavkirin. Mirovên ji her neteweyê hatine agahdarkirin.
Her wiha, di rewşeke awarte de di çarçoveya çalakiya nobedê de li Strasbourgê çalakiya rûniştinê ya girseyî, greva birçîbûnê hatin lidarxistin û daxuyanî hatin dayin. Bi Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê ya Konseya Ewropayê (CPT), Konseya Ewropa, Parlamenta Ewropa û saziyên cuda re hevdîtin hatin kirin û qala tecrîda giran a li ser Ocalan hate kirin.



## Kurd bandorê li Rojhilatanavîn dikin

Zekî BEDRAN

Gelên Tirkiyê di 24'ê Hezîranê de çûn ser sandoqan. Ev hilbijartineke ku pêşeroja Tirkiyê eleqeder dike. Têkçûn û lewazbûna tifaqa AKP-MHP'ê wê Tirkiyê ji pencên şer rizgar bike. Ji vê yekê wê ne tenê gelê Tirkiyê, gelê herêmê jî wê rihet bibe.
Weke tê zanîn di dîroka Tirkiyê de bloka herî faşîst û nijadperest li desthilatiyê bûne yek. AKP, MHP, Ergenekon, Perînçek û hwd, hemû bûn yek. Hevbeşiya wan şerê li dijî Kurdan bû. Şerê li dijî Kurdan tê wateya şerê li dijî demokrasiyê. Wekî din ne gengaze ku şer li dijî kurdan were kirin. Şerê li dijî kurdan heman demê şerê li dijî cîranan û dagirkeriyê jî bi xwe re tîne. Tê zanîn Tirkiyê êrîşî Sûriyê kir Cerablûs, Bab û Efrîn dagir kir. Bi vê jî nema. Berê tankan da başûrê Kurdistanê. Pêşengî kir ku Kerkûk ji destên kurdan were girtin. Tevî bi dehan baregehên xwe yên leşkerî yên li başûr niha jî bi awayekî eşkere dest bi êrîşên dagirkirinê kiriye. Hêzên xwe yên leşkerî derbasî Sîdeka kiriye, herêma Biradost dagir dike û dibêje "ezê Qendîlê bigirim".

Di encama tifaqa bi Rûsan re herêma Efrînê ku li Sûriyê herêmeke herî bi aram bû li ber çavên dunyayê dagir kir. Bi sedhezaran mirov ji cih û warên wan derxist. Bi paqijiya etnîkî û guhertina demografyayê sûcê mirovahiyê dike. Weke xencerê li dilê Sûriyê hatiye xistin. Bi komkurina çeteyên li Sûriyê li dora xwe hem pêşeroja Sûriyê û hem jî hemû Rojhilatanavîn xistiye bi tehdîtê. Ev tehdît di serî de gelê Kurd li dijî hemû gelên herêmê û demokrasiyê ye. Li dijî Îran, Iraq, Sûriyê û hemû gelên herêmê eşkere dijmintiyê dike. Dema tengavî dibe xwe dispêre Rûsyayê dema ew jî nebû direve cem Emerîkayê. Bi gelan re li şûna cirantiyeke baş, girêdayî zordariyê dixwaze wan ji hêzê bixe û bi hev bide şerkirin.

Li Rojhilatanavîn Tirkiye deşîfre buye û maskeya wê ketiye. Hewldanên wê yên dagirkeriyê eşkere bûne. Ji bo ku li ser hemû Sûriyê bibe xwedî gotin timî destwerdanê dike. Emerîka û Rûsya jî teşwîq dikin. Erdogan demekî ol weke maske bikartanî û hewl dida ku li der û hundir piştgiriyê bistîne. Niha ev lîstik jî bi dawî bû. Hêza sereke ya ku Tirkiyê ji lîstikên şer û faşîzmê rizgar bike û her wiha nefesê bide gelên herêmê Kurd in. Kurd li herêmê weke hêza herî dînamîk, bi bandor û demokratîk pêşengiya xwe berdewam dikin.